

## HIM “LÎRÎK”, HIM CELAT, HIM “PASÎFÎST”

Dadkir bû. Kê carekê dîtibû, wekî ew çawa dada merya dike (ew heq bûna yanê neheq bûna), te temamyâ zulma zakona mehkemîê tex'mîn dikir.

Ewî usa jî helbest dinivîsîn. Xwe helbestvanekî ehrede hesab dikir. Helbestê xweda bi xebere hişke-hola pesnê meriva, tebyetê dida, evîntî, merivhizî dipesinî.

Dihate kivşê, ewî bi destekî biryara dadê derdixist, cezaê giran gelek cara dida merivê bê sûc – bê gunê, lê bi destê mayîn helbestê vike-vala dinivîsî, pesnê heqîê, rastîê, evîntîê, merivhizîê dida.

Ez berê kîjan destê wî bawer bikim?

Ew gunekar nîbû. Wextê wî usa bû: her kurdekî pirî-hindikî xwendî borcê xwe hesab dikir şîera binivîse û xwe hesabke şayîr. Kê ev yek qebûl nedikir, dêmek ew merivekî ne ser hemd-hişê xwe bû, dijminê çanda me bû.

Carekê civata sêksîa nivîskarê kurdada, gava berevoka efrandinêd wîye neşirnebûyî enene dikirin, şayîrekî meyî eslî fikra xwe got derheqa berevokêda çawa ne efrandinê bedewetîê, “şîera” wîye “Edlayî” berk rexne kir.

Xudanê “şîerê” hilda ha got:

- Çiye, tu miqabilî edlayêyî?

- Ez ne miqabilî edlayîme. Ez miqabilî tiştê hame, ku bin navê lîtêratûra bedewetîêda têne derbazkirinê.

Bû pîrqînya şayîr û nivîskarê meye cahil. Ew dengê cahila bû, wekî îdî nava lîtêratûra bedewetîêda dihate bihîstinê.